

Qanûna piştgirîyê û xizmeta ji bo hin kêmfonksîyonan (LSS)

LSS çi ye?

Qanûna piştgirîyê û xizmeta ji bo hin kêmfonksîyonan [Lagen om stöd och service till vissa funktionshindrade] (LSS) qanûna mafek e ku ji bo kesên bi kêmfonksîyonîyeke giran û berdewamî şertên jîyanê yê baş garantî dike vî awayî ew dikarin alîkarîyên pêwîst a di jîyana wan a rojane de werbigrin û ew dikarin tesîrê li ser piştgirî û xizmetên ku werdigrin, bikin.

Daxwazek ji kesek ku li gora vê qanûnê di gruba ew kesên ku tên binavkirin de cîh digre, bi şertê ku cîhê lê muraceat hatîye kirin dezgehek ku di qanûnê de tê behskirin be, di destê yekem de li gora vê qanûnê bê nirxandin. Sedema vê yekê ew e ku, bi giştî tê texmînkirin ku ev rê di berjewendîya kesê xwedîyê muraceatê de ye. Van alîkarîyên di qanûnê de hene, bi tenê dema mirov bi xwe muraceat bike dikare werbigre.

Mafê kî heye ku ji tedbîrên li gora LSS îstîfade bike?

Ji bo ku mirov ji tedbîrên ku di qanûnê de hene îstîfade bike, divê mirov daxilî gruba kesên ku di qanûnê de hatine destnîşankirinê be. Ew kes didivê ji bo birêvebirina jîyana xwe hewcedarê alîkarîyê be û ew alîkarî bi awayek din nikaribe bê wergirtin.

Qanûn ji bo van grubên jêrîn derbas dibe:

1. Kesên ku ji dema ji dayîkçêbûnê ve kêmpêşketî bin û kesên bi nexweşîya autîzm yan jî di rewşên weke autîzmê de bin.
2. Kesên ku pê re kêmfonksîyonîya şîyanî ya giran û berdewamî ku mêjîyên wan di emrê xwe yê mezin de ji ber derbeyek yan jî nexweşîyek laşî, xesar dîtibe.
3. Kesên ku ji ber sedemên kêmfonksîyonî yê fîzîkî yan jî psîkolojîk yê din ku giran û berdewamî ne û ne encama kalbûyînê normal in û loma jî rêvebirina jîyana xwe ya rojane de gelek zehmetîyên wan hebin û hewcedarê piştgirî û xizmetên mezin in.

Deh mafên/teadbîrên ku ji bo van grubên ku di Qanûnê de hatine dîyarkirin ev in:

1. **Şêwirdarî û piştgirîyên şexsî yê wekî** din [Rådgivning och annat personligt stöd] Kesên ku di grubên di qanûnê de hatine dîyarkirin cîh digrin, dikarin piştgirîya pisporî ya bi kalîte werbigrin ku ew pispor ne bi tenê bi zanînen xwe yê meslekî lê her weha bi zanînen xwe yê taybetî yê li ser pirsê jîyanek bi kêmfonksîyonî çawan e, dikarin alîkarî bikin. Ev alîkarî dikare ji aliyê şêwirmendan, psîkologan, jîmnastîknasên nexweşîyan, şêwirmendên zarokxaneyan, logopedan, terapîstên kar û dîetîstan ve bê amadekirin. Şîret û alîkarî divê bo nimûne ne di şûna habîlîtasyonê rehabîlîtasyon û xizmetên civakî bigre, lê weke xizmetên ku van tiştan temam bike bê amadekirin.



2. Asîstaniya şexsî [Personlig assistans]

Kesên bi kêmfonksiyonîyên giran ku hîn 65 salên xwe temam nekirine xwedîyê maf in ku ji alîyê yek yan jî zêdetir asîstanên şexsî ve alîkarî bigrin.

Ji bo ku mafê kesek ya asîstana şexsî hebe, divê pêwîstîya alîkarîyê ji bo paqijîya şexsî, xwarin xwarinê, cil li xwe kirin û derxistinê, bi kesên din re peywendî danîne yan jî hewcedarîya alîkarîyên din ku zanînen kûr û zêde li ser kesê kêmfonksiyon tê xwestin, hebe.

Mirov dikare ya bi rêya beledîyeyê asîstan bigre yan jî dikare alîkarîya aborî werbigre da ku bi xwe asîstanek bigre.

Ji bo kesên ku di hefteyê de ji 20 saetan kêmtir hewcedarê asîstan inç berpirsiyarîya aborî bi tevahî li ser beledîyeyê ye. Eger hewcedarîya mirov ya asîstanek di hefteyê de ji 20 saetan zêdetir be, mafê mirov heye ku tezmînata asîstanîyê (assistansersättning) werbigre. Mafê vê tezmînatê li gora qanûneke din ku jê re Qanûna li ser Tezmînata Asîstanîyê (LASS) tê gotin, mirov bi dest dixê.

Biryara tezmînata asîstanîyê ji alîyê Daîreya Sîgortayê ve tê dayîn. Di rewşek weha deç ji bo 20 saetên pêşîyê, beledîye berpirsiyarê aborîyê ye.

Ji bo kesên bi kêmfonksiyonîyên giran ku 65 salên xwe temam kirine qaîde ew e ku ya divê ew berîya ku 65 salên xwe temam bikin xwedîyê asîstanîya şexsî bûbin yan jî muraceata xwe ya ji bo asîstanîya şexsî berîya ku 65 salên xwe temam bikin, kiribin. Lê dema wergirtina asîstanîya şexsî piştî temamkirina 65 salî nikare bê zêdekirin.

3. Xizmeta rêberîyê (Ledsagarservice) [Ledsagarservice]

Mafê xizmeta rêberîyê ji bo kesê ku asîstanîya şexsî wernagire, heye.

Xizmeta rêberîyê divê weke xizmeteke şexsî bê amadekirin, li gora rewşa şexsî yê kesê hewcedar bê amadekirin ku kesê hewcedar bi rehetî bikaribe di jîyana civakî de beşdar bibe.

4. Kesê peywendîyê [Kontaktperson]

Ji bo ku îzolebûyîna civakî kêmtir bibe, alîkarî bê kirin ku di çalakîyên ji bo demên vala de beşdar bibin û di hin rewşên jiyana rojane de şîret û rêberî bê kirin, carina pêwîst e ku kesek peywendîyê hebe. Kesê peywendîyê dikare ji bo şexsek rehetir bike ku bikaribe jîyaneke serbixwe bijî. Ev alîkarî carina dikare ji alîyê malbatek ve ku jê re malbata piştgirîyê tê gotin, bê dayîn.

5. Xizmeta nobedarîyê ya li male [Avlösarservice i hemmet]

Xizmeta nobedariya ya li malê hem dikare weke xizmetek berdewamî hem jî weke xizmetek ji bo di rewşên ku mirov pêşwext nikare bibîne, bê wergirtin.



6. Li derveyî mala xwe ji bo kurtedemek mayîn [Korttidsvistelse utanför det egna hemmet]

Xizmeta li derveyî mala xwe ji bo demek kurt mayîn tê amadekirin da ku îmkana xwe nûhkirinê û guhertina jîngeha civakî bê dayîn û her weha malbat û merivên kesê hewcedar bikaribin bêhna xwe vedin. Ev xizmet dikare li xanîyên kurtedemî de, li cem malbatek din yan jî bi awayên din, bo nimûne li kampek yan jî li cihê tatîlê bê amadekirin.

7. Çavdêriya kurtedemî ya zarokên xwendevan yên ji 12 salî mezintir [Korttidstillsyn för skolungdom över 12 år]

Hem berîya hem piştî demên dibistanê û hem jî di demên tatîlê de divê çavdêriya zarokên xwendevan yên ji 12 salî mezintir, bê kirin.

8. Li xanîyên malbatî yan jî li xanîyên bi xizmetên taybetî ji bo zarok û xortan de mayîn [Boende i familjehem eller i bostad med särskild service för barn och ungdom]

Zarok û xortên ku nikaribin li mala dêûbavên xwe bimînin dikarin xwedîyê maf bin ku li cem malbatek din yan jî li xanîyek ku lê xizmetên taybetî ji bo zarok û xortan tî amadekirinê de bimînin. Ev xizmet divê ji bo hem zarokên ku dikarin dem bi dem li mala dêûbavê xwe bimînin û hem jî ji bo zarokên ku nikarin li mala dêûbavê xwe bimînin, weke temamkirina mala dêûbavê bî amadekirin.

9. Li xanîyên ku ji bo mezinan xizmetên taybetî lê hene yan jî li xanîyek din yê bi taybetî amadekirî de mayîn [Boende med särskild service för vuxna eller annan särskilt anpassad bostad]

Ev xizmet dikare bi awayên cuda bê amadekirin lê yê awayên herî giştî xanîyên ji bo grubî mayînê [gruppboend] û xanîyên xizmetê [serviceboend] ne. Ji bo kesê hewcedar dikare her weha ji alîyê beledîyeyê ve xanîyek bi taybetî amadekirî bê dayîn.

10. Çalakîyên rojane [Daglig verksamhet]

Kesên ku di emrê karkirinê de bin û bê kar in û naxwînin xwedîyê maf in ku di çalakîyên rojane de beşdar bibin bi şertê ku ew li gora LSS di grubên 1 û 2yan de cîh bigirin.

Mesref

Ev xizmet û tedbîrên taybetî weke qaîde ji bo kesên hewcedar re belaş in lê hin îstîsna hene.

Plana şexsî [Individuell plan]

Kesê ku jê re li gora Qanûnê biryara xizmetek amadekirinê hatibe dayîn, dikare daxwaz bike ku jê re planek şexsî bê amadekirin ku tê de xizmetên ku biryar li ser hatine girtin û yê tî plankirin, hatibe dîyarkirin. Plan tevî kesê ku xizmetê werbigre divê bê amadekirin.

Dema ku kesek kêmfonksiyon li gora Qanûnê xizmetek werdigre, ew dikare daxwaz bike ku ji bo wî/wê planek şexsî bi beşdarîya wî/wê bê amadekirin.

Kesê hewcedar divê xwedî îmkana be ku naveroka planê tayîn bike, di amadekirina planê de kî beşdar bibe û bikaribe daxwaz û hewcedarîyên xwe bibêje.



Di planê de divê her weha bê dîyarkirin ku mirov dê çawa bigihîje armancên xwe. Di planê de divê hevkarîya hemû alîyên eleqedar ya alîkarîyê cîh bigre

Planê de ev xalên jêrîn dikarin cîh bigrin

- Bi kurtî taswîrkirina rewşa tevahîya malbatê, pêşerojê, kingê dibistan vedibe û hwd.
- Xizmetên ku nuha tên dayîn
- Xizmetên ku pêwîst in/dê pêwîst bin
- Xizmetên ku malbat daxwaz dike.
- Kesên eleqedar (endamên malbatê jî tê de) dê çi bikin û dê kîngê bikin
- Pêwîstîyên malbatê çi ne? (xwişk û birayan ji bîr nekin!)
- Em dixwazin çawa alîkarî werbigrin?

Tiştên ku di planê de hatiye dîyarkirin nayê maneya ku biryara qebûlkirina wî xizmetî dê bê dayîn.

Plan divê, pirî caran salê carek, ji ber çav bê derbaskirin.

Muraceat

Li her beledîyeyek memurek taybetî ya pirsra LSS yan jî memurê alîkarîyê li gora LSS heye. Muraceat dikare hem bi nivîsandî bê kirin û hem jî dema hevdfîneke bi memûrê berpîrsîyar ve, bi devkî bê amadekirin. Divê kesê kêmendamiya xwe xwedîyê muraceatê be.

Agahdarîyên zêdetir

Qanûna piştgirîyê û xizmeta ji bo hin kêmfonksîyonan (1993:387) (Lag (1993:387) om stöd och service till vissa funktionshindrede)

Pêşniyaza Hikumetê li ser piştgirîyê û xizmeta ji bo hin kêmfonksîyonan (1992/93:159) (Proposition (1992/93:159) om stöd och service till vissa funktionshindrede)

